RONDIK SIMFONIYA ME DIRÊSIN

STIRANEK BO TEV SEMAKERÊN GOVENDA MEZIN

Beşîr Mizûrî

Gelll…
Ji kûratiya hesretê
Ji dûratiya birînê
Ji pîratiya aryanê
Vedirêjin…
Bi ser rûkên
Sar û vemiryayên bajêrê min yê nivistî de
Dadikevin…
rondikên te
Ez rêvingekê rê ya dûr im
Nojdarê girêbendên hevsûyên
Bi stiraneka bi kofî û por im
Rêving im …
"Ez yê hatîm ji bajêrekê sirbirî
Ji warekê
Ji ser xuranê-maye xefet-û ji bîrkirî"
Çi bajêrek xewte ye û
Ez derwêşê terîqetê
Kolanbirê mihebetê…
(şeydayê gulistana)…
Ev çi derên li taq in?!
"Ev biçûkên li ber derî çînkanê dikin
Ne dostin… ne tena dibin
Ne carekê keç dibin û dibêjin
Yên bûyîne kurs û
Stiraneka bi sehim dibêjin…"
- Deûûû…
- Hiş be
- Çinet!
Û tu yê sermest
Ez jî
Bo hêlînekê yê bûyîme meest…!
Rondikên te…
Keniyê min kip kir
Mestiya min şil kir
Stirana (werzê pêncê…)
Awaza dilek gerok
Peyama hestek kevok
Çar xula bi tinê guh bidinê:
"Ev e ez dê vegerim
Li werzekê dî gerim
Viyana me bibît asman
Stêra ji çavên te biçînim
Ne zistana xwîsarbûna hezên min
Ne payîza weryana tev xewnên min
Ne havîna sotina wêneyên min
Ne bihara geşbûna bi xemên min
Werzekê dî dilberê
Çê bibît bo hemû dema
Sibe zû rabibin ji xew
Ku tev gul yên çûyîne sema
Werzekê dî ve bibînim
Gula bi gule bidim
Hemû gula bigorînim
Bişkoja bi sînga vekim

Cîhana bikim evî werzî
Bi ava lêvên qurmizî
Bibin balinde û bifirin
Vebibînin xewnên dizî
Li vî werzî û li vê hebînê
Ji bîr bikîn rengê xwînê
Bi bîhna evîn û maçan
Bireşînin evê jînê
Di baweşa sîngê te de
Û binivim xewna bibînim
Di nav hêzoka zendên te de
Stirana xwe bilorînim
Di nav hêzoka zendên te de
Werzê pêncê ez bibînim"
Birim… birim
Li sermaya hîtoyekê semavan
Asê kirim
Giriyeka pengiyayî û
Birîneka
Di sîngê te de bû ye mexel
-(Derwêş)…
"Dê ji birînan pêlayeka mezin / çêkey/…ala li ser
Dê ji xwînê sorava periyek xin/ lêkeyî/ … feza li ber
Dê ji dîroka pirtpirtkirî hîzareka spî /vehûnî/ okeye
Tara û
Dê stirana- cinetê- bêyî"
Zingila dêrê lêdî
Mêriyan qutê xwe bar kir
Evê biwîkê xemla xwe ji kar kir
Evan xêrxwazan
Sirûda spêdê bang da
- Hê yî (daxdayê eşqeka sur yalî)…
"Ev çar nîv mirov
Di çar rojan de
Bûne "qebahet"!
Ev çil milyonên mirovan jî
Li ser bextê himû mirovatiyê
Mayîne ve çar ker xîvet"
Û li wêra he û
Li perê gundî
Bûne veket…!
Û tu jî yê mest
Rondikeka te dilê min gest
"Xapînokê… xapînokê
Tu bûyî stirana (şûngira) û şeverokê"
Rondikên te…
Şeva me ya kiwîrkirî
Rêka mala me ya diwîrkirî
Û minara bangeh li Dêrê
Sofî çûne pêra …
Gellll… ji kûratiya birînê
Pelll…rûkên te ji tînê û
"Çiyayên dikin dawetê
Da roj ronahiyê biditê"
Cama te ya vala bûyî
Rondikek tinê ketê
Û… wa he mala min e
Kî dê min betê…?!
Rondikên te…
Were da pêkve stiranê bêjîne ve:
"Ka perdeyên çavên xwe vede û
Ez dê çavên xwe vekim
Rondikek ji çavên te
Rondikek ji çavên min
Peymanekê bi rondika dê nivîsîn
Sozekê bi rondika dê rêsîn…
Singê wê bibît mala me
Lîsekê sil ji birînê
Dilek te jî ji kenînê
Warek eşq û evînê
Penahek vala ji kînê … û
Rondikên te…
Ahîna…rondikên te
Biriya jan û hesretê
Bangek bo Qiyametê
Ne gelek…piçek ji mirwetê
Ma kengî guneh e
Em jî bilind bikin ala dewletê?!!